**CÎHAN ROJ**

# *Pênûsa ter*

**Weşanên Taybet ên Kovara MEHNAME: 5**
Sal 2001
Copyright © Cîhan Roj & Kovara Mehname

***"Cotê xwe hûr bajo, kûr bajo, dûr bajo"***

ZERDEŞT

***"Gihayên hewşê bi hewşê tal e"***

***"Her giha li ser koka xwe şîn tê"***

*JI FOLKLORA KURDÎ*

# Naverok

**1. Rêgez**
**2. Çîrokên van deran pir in**
**3. Pêşgerîn**
**4. Serma**
**5. Tamsarkî**
**6. Robotxwir**
**7. Delavên latan**
**8. Qorîçî**
**9. Bajarê yezdan**
**10. Şewat**
**11. Nameya sehneyan**
**12. Dengê ji destanê**
**13. Birîndar**
**14. Leyla**
**15. Gelî**
**16. Çîroka şevê**
**17. Çavên gojîbûyî**
**18. Çekên herî xurt**
**19. Sergo**
**20. Kûrahî**
**21. Ristên stûr**
**22. Çemê ji xwêdanê**
**23. Çavkanî**
**24. Kela Dêrsim**
**25. Karesatên tenik**
**26. Bo melodiyek germ**
**27. Baskê mirinê ter in**
**28. Hiş weke dilopên rûn li ser dil diqijile**
**29. Biçûka berfê**
**30. Tîna destan**
**31. Bayê ku kon vegirt**
**32. Hêviyên zistan**
**33. Masînaz**
**34. Bistiyek ji barê min**
**35. Av tazî dibeziya**

## *RÊGEZ*

***ku gotin dibe çemê hestan***
***Jiyan dibe şîrê şêr***
***Baskên we hevalan***
***Rûpelên deneşe li asîmanê heftan radixe..***

## ÇÎROKÊN VAN DERAN PIR IN

***Sibeha ku tê de şiyar dibin***
***me bi heval kirin***
***"cî ji dilan teng dibe "***
***me silava xwe***
***di rengan de veşartiye***

## PÊŞGERÎN

***Quling hatin ji warên hineyî***
***li ser darên topîn***
***ji giraniya xêliyên sor***
***guliyên şkestî***
***zerva ne***

## SERMA

***Şîretên sor***
***li kelemekê***
***xala di bin baskê***
        ***vizikekê de ye.***

## TAMSARKÎ

***Sîevdalê welatê xwe***
***kilaman bi xwe re***
***çi qas peyv kuştin***
***peyvên wek dergûşên xayîz***
***me ruhê duyemîn***
***ji yezdanên birçî û dirinde***
***ne stand***
***tîna şkestî de***
***çendî çirûsk firiyan***

## Robotxwir

***dê hûn ji ber cinawirên xwe***
***ber bi çiyayên azev ve bibezin***
***hulmek hewa***
***dê bibe dunya***
***ji bo we robotxwiran***

## DELAVÊN LATAN

***Pîrejineke hilhizî***
***di bin zinareke asê de***
***li ser cilekî gelêrî***
***aşpervana delavên latan bû***
***fişekeke dagirkeran..***
***xwîna wê neqşeke dî li cil zêde kir...***

***1994***

## QORÎÇÎ

***Henga zarok xwîn  vedirêşin***
***ew bi gotinên  qusandî re***
***çirayê ditemirînin***

**1994**

## BAJARÊ YEZDAN

***Ku raman dike orîn***
***Heskîf dike nalîn***
***hewrên ji çavên bedewan reştir***
***li gola tî dicivin***

***1995***

## ŞEWAT

***Ev dixan ji xaniyên cangorî bilind dibe***
***ne bêhna nanê genim jê tê***
***ne jî bêhna bijênekên ji dawa mihên***
***serhedê***
***reş e***
***di çavên almastî de***
***weke marê reş hildikişe***

***1995***

## NAMEYA SEHNEYAN

***Kal***
***bi nanê sêlê re***
***çeqilmastê zozanan vedixwar***
***kefîka sabûna kartû***
***çavên pitikê dişewitand***
***Dayîk***
***gulî bi melodiyeke xav re dihûnand***
***sûretê di ava şîlo de***
***diran diqerisand***

***1995***

## DENGÊ JI DESTANÊ

***Ji barê gulan bêhna tenik e***
***li welatê berxwêdêran***
***kûrahiya dengê dengbêj e***
***bi Memê Alan destpêkir***
***bi Nazê û Husa awaz germ kir***
***di tîna agirê Reşan de***
***nav li melodiya xwe kir***

***1996***

## BIRÎNDAR

***Ax ji wê tîtir bû***
***dilopên biharê lêvên wê***
***xwîna wê jî ax şil dikir***

***çendî kanî di canê wê de derbûbûn***
***hew sosinek di ser hinarikên rû de tewand***

***1996***

**LEYLA**

***dilopên ji ewrên  reşeşîn de***
***datên***
***ji gola Wanê***
***silav anîn***

***1997***

## GELÎ

*geliyê Bedlîsê geliyê Bedlîsê*
*tu mîna çira di tariyê de diteyîsî*

*tama sêvên xelatê*
*berfa serê nemrûdê*
*dengê çemê te xweş tê*
*geliyê Bedlîsê*
*gelyê Bedlîsê*
*gelî kûr e*
*deng nade*
*hêvî dûre*
*hişk nabe*
*geliyê Bedlîsê*
*geliyê Bedlîsê*

*1996*

## ÇÎROKA ŞEVÊ

***Şev e***
***Agir ji himbêzan  hildibe***
***çîroka ku hate nivîsandin***
***ji kevzeyê şîn  nermtir e***

***Şev e***
***Ji ber çakûçên kawayên ciwan***
***çirûsk ref bi ref in***

***1997***

## ÇAVÊN GOJÎBÛYÎ

*Peyvên bi tîna dilê Zîn kelya ne*
*bi tevî peyvên helbesta sê hezar gundên*
*şewitandî*
*xam in*
*melodî*
*ji tepîna dilê çivîka di nav nukulên qertel de*
*nermtirin*
*xamiya peyvan ji hevokan re bûka du salî ye*
*peyvên ku wisa xav û xam mane*
*bo pênûsa ter*
*wek xofa marê li ser zendên Dehaq*
*li kolanên biyan cî daye pîrêza*
*ji Şûrê hz. Elî tûjtir*

*di nav xumamiya vê şevreşkê de*
*çavên zarokên gojîmestî*
*bi tevî peyvên qusyayî*
*kawîsek di dilqê bêrîvaneke derengmayî de ne*

*1998*

## ÇEKÊN HERÎ XURT

***We weke cotên pêsîran***
***zimanê   me  parast***
***di meha çile de***
***reşikên şiliyê***
***lehî rakirin***

***1998***

## SERGO

***Sergo mîna dilê dagirkeran***
***dîwar lê nayê lêkirin***

**1998**

## KÛRAHÎ

***Li perava ava şîn***
***kenê neviyên medan e***
***Li çiyayê sîpan***
***beza xezalan e***
***di mêrga sosinan de***
***weşa gul û rîhanan e***

***1998***

## RISTÊN STÛR

*Bilûr careke din deng nade*
*Reşemî xwe vedişêre*
*di çavan de dilopên avê bûne teneyên xwê*

**Reşemî, 1999**

## ÇEMÊ JI XWÊDANÊ

**ku marek li ber çavê we bi goriyê we de vebide , zarok çavên xwe êdî hîç venakin, dê hûn jî serê mar bikin devê xwe û di nav diranan de parçe parçe bikin û xwe jî
jardadayî bikin**

**çav û madeyê we yê têrxof
va li pêşberî min
li ku ye, dîmenek ji welatê min vedişêre
lê
hûn însanek ji welatê dagirkerî bin
di şerek qirêj de
serên jêkirî di bin potînên însanan de bin
dê hûn jî weke dayîk
bibin bengî darê aştiyê....**

**ji xeynî xwêdana ji kedê diherike
hîç xwîna birîndaran li ser pişta
we
bûbû ewrê reşetarî
we hîç dengê dergûşa li ser sînga
bêcan bihîst
hîç jana têlên tixûbên kaxizî
da dilê we...
çend hêlên we bûye warê "mayîn"an
çendî " Qere lastîk" çiyayên we jî ramûsan
çi ye êk nahêle ziman li we bigere
dayîkên qîzên şevê
li ser kolanên we ne
vêca paceyê ne ji bo
qîrên esrarkêş
ne ji bo dengê hilkehilka tetikvan
ne ji bo hewarên jîna firotî**

## ÇAVKANÎ

***1.***
***Li ser bûtên şîlanan sor dixemile***
***hêşînê tarî azmanî ye***
***bistîyên ter***
***weke Edûl , Dewrêş bihewîne***
***2***
***Mirovên welatên bindest***
***dilop in***
***ji teneyên qevdeyê***
***Gîhayê di zinaran de bişkivî***
***3***
***Ev helbest***
***morîkeke***
***bi çiyayên asê dimije***

***28 rêzber 1999***

## *KELA DÊRSİM*

***Mamikan- kalan -Dêrsim***
***wek diya min li ber serê min be***
***Dêrsimî bû, dayîk bû***

***weke çîroka dawî***
***gulên aştiyê***
***ji hemî çîrokan kir barek***
***û dîsa da ser milên xwe***

***ev ziman weke avê çeman e***

***ji rojên berfanbara 1999an***

## KARESATÊN TENIK

***Wextê lêvên te weke berfîna zozanan dibişkivin***
***ji çavên te tîrêjên biharê bi rê dikevin***
***tîrêj bi dilopên  qolon ya û araviya laylonê tre***
***dîwaran hildiweşîne***
***li ber  rezên avdayî dibin destan***
***li welatê me***
***hewrên reş  di nav ava Dîcle de wenda dibin***

***1999***

## BO MELODIYEK GERM

***Vebikin***
***ne hewceyê serî dirêjkirinê ye***
***hew paceyê vebikin***
***bila sînga we ya germ hênik bibe***
***wê quling  ji qirşikên sivnikên we***
***hêlîn avabikin***
***dilê me li we xweş e***
***sikakên xemilandî malên  azadiyê ne***

***berfanbar     1999***

## *BASKÊN MIRINÊ TER IN*

***Pelê cixarê***
***li ser delavekê***
***weke kirasê te***

***av weke kenê te***
***kuştinê vedişart***
***tiştê ku te pê nelîst***
***mirin bû,***
***hêviyên te germ dikir***
***û***
***te ji xwe dûr dixist***

***çavên bişkivî***
***biskek bedewe***
***di nav bablîsokê de***
***bûye qulingên biharan***

***tu behr î***
***xeyalên ku tisî ne***
***li ser te weke pelên cixarê***
***çîroka pareyên pelê***
***quling dixwînin***

***1999***

## *HIŞ WEKE DILOPÊN RÛN LI SER DIL DIQIJILE*

***Mirin çend caran derî li te vekiribe***
***gelo ?***
***perda dilê te di çi rengî de bûye ?***
***pêvajoya ku xwîn dadilopî***
***konê xwe hilweşand***
***sikakan xeyîdandî kêsim in***
***niha tu , tilî li ser simbilan***
***yekî qemer î***
***kon dîsa li erda xwe digere***
***tu ku ve diçî***
***xamiya te de hêvî dê birize***

***Sal. 2000***

## *BIÇÛKA BERFÊ*

***Piliyên berfê***
***bihustek ji serê wê***
***bilintir***
***hewrek ji sînga wê***
***teng û firehtir***
***xemilandibû***
***pîliyek weke***
***azaveke nazenîn***

***geh xwe li bê mirî***
***digirt***
***geh weke birîndarek***
***xwe ber bi wê ve dikişand***
***berfê ku dafik xemilandibû***
***nixwimand***

***pilî di çavên xwe de kuşt***
***şapêkê li ser çîpên wê***
***bibû textik***
***reng guhrtibû***
***ziman lê nedizîvirî***
***peyvan di sîtila dil de***
***xaxê hevok***
***û qêrînê de bûn***

***Sal. 2000***

## *TÎNA DESTAN*

***Destê ku di kêliyên***
***merhabayê de***
***dibin pêtî***
***dibin ax***
***û***
***kulên însan dihewînin***
***û***
***dibin xemav***
***di pênûsa***
***nivîskara ku***
***berhemên xwe vedişêre de***

***Sal. 2000***

## *BAYÊ KU KON VEGIRT*

***Ger ax dilê te bûya***
***av hestên te***
***Te yê şûrê zengarî Vehewan da***

***Seyên navgund ji bo parçeyên hestiyan***
***ji te bagerên biçûk diafirînin***

***Dilê te "dara Dunya yê"!***
***Ruyê zinara ne***
***di teriya xwe de***
***Zemîna te yê şîn***
***li stuyê min pêçayî***

## ***HÊVIYÊN ZÎSTAN***

***parceyên kincên dînên li beyaran***
***şitlên havînî ne***
***min morîka xwe bi biskên avên xayîz***
***bi dengê xav ve daliqandî ye***
***ax e hûr diherike***
***azev e  tîr dibare***
***ez di destê xwe de têjikek***
***yek royî û dîl***
***bistiyên bargiran***
***ber êvaran de cav li terî ye dipişkivin***
***ji salên cûyî re***
***xweliya cixarê dijênin***
***yezdanên bircî***
***av li rêwiyan sayakî***

## *MASÎNAZ*

***Masînazek nîvçe***
***li ser canê zarokekê esmer***
***di gola gerînek de***
***dişibe tîrêja awêneya xortek***
***di bêhna axê de***
***ji mîha xwê lêketî***
***revoktir***

## *BISTIYEK JI BARÊ MIN*

***Cûnek benîştê qusyayî***
***cend gotinên xama***
***keriyên di kolanên vemirî de***
***nanek ketî ye***
***para seyên pîr***

***Dengên tirs de***
***cêrên şivanên bê sikarte***
***dibin teyrên baskşikestî***
***li ber cavên pisîkên şermezar!***

## *AV TAZÎ DİBEZİYA*

***Av tazî dibeziya***
***ji du cavên li gathayan pişkivî tazîtir***
***cemek e ji çavkaniyên koçber derbûyî***
***ber bi axeke azev ve rê dide xwe***

***refeke çivîk li demsalên wenda digerin***
***cavê karî xezalan li ser berfa xisik konek***
***bê stûn e***
***di pirsên zarokên mediyan de***
***stûna hevokan ditewe***
***weke ku cotkarek serhedî dengê reşîlekekê bihîstibe***
***di şeveke sikesar de dest dirêjî hewrek reşesîn bike***
***gur bikevin rêyên belekiyên berfê***
***di jiyaneke xayîz de***
***refên me***
***te ji moriyên şîn***
***çarîkên zîvan***
***tasên mitriban***
***gotinên kulek dizî***
***hin jê mêsên dûdayî bûn***
***noqî şerbeta tîr bûn***
***niha tiliya te ya tuneyî***
***dareke xoxel e li pala çiyayê bi dergîst î***

**Weşanên Taybet ên Kovara MEHNAME: 5**
Sal 2001
Copyright © Cîhan Roj & Kovara Mehname